

*Dr Nûredîn Zaza*
*1919- 1988*

# Newroz




*Osman Sebrî*
*1905 - 1993*

*Xebat ji bo* : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe .
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan .
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê* - YEKÎTÎ

*Hejmar ( 94 ) sal 16 Ç. Pêşîn 2010 z - 2622 k Buha ( 15 )ps*

## *Hejmarek* Nûçeya Reş *Taybet*



Roja duşemê, 18ê Çirya Pêşîn, dilê xebatkar, Kurdperwer, welatparêz û têkoşerê hêja, birêz Îsma'l Omer rawestî , ji dinya ronik barkir û çû ser dilovaniya Xweda. Roja dî, 19ê Çirya Pêşîn, kat 10ê sibê, bi beşdariya basikên tevgera Kurd, komeleyên mafên mirovan, hêzên welatparêz yên Ereb û Asor,basikên partiyên komonîst , rewşenbîr , civaknas, komên folklorî û bêtirî hezar otormbîlî, ji Pêş mizgefta Qasimo, cendeka wî ta kolana Hilêliyê li ser milan bi silogan , durişim û lîliyan hate rêkirin. Paşê , kewranê birêz bavê Şiyar berve Amûdê bi rêket. Li ber dergehê Amûda bavê Mihemed, komek ji heval û berketiyên wî, bi durişma partî, wêne û alên reş pêşwaziya termê bavê Şiyar dikirin û seranserî kolana Amûdê firoşxan hatibûn girtin, û xelkê Amûdê bi dilekî xemgîn û hêstirên çavan li ser herdu kenarên riyan sekinîbûn. Pişt re, kewran, tevî pêşewaziya beşek ji xelkê Dirbasiyê, di nav Bajarê Dirbasiyê re, derbas bû , ta giha gundê Qereqoyê. Piştî di goristana gund de hat veşartin, dest bi rêwresm û gotinan bû Pêşî kêlîkek bêdeng li ser giyana rehmetî **D.R ( 2 )**

Kurtejiyana Heval Îsmaîl 3
Nameyên sersaxiyê 4
Gotina rêxistana Ewrpoa 9
Nameyên sersaxiyê 11

*Email : Newroz 95 @ hotmail . com*

www.arsivakurdi.org

û bixêrhatina mîvanan ji hêla partiya Yekîtî ve û paşê jî :
************************************

**Gotina Encûmena giştî ya Hevbenda Demokrat a Kurd li Sûriyê, ji hêla mamoste Reşîd Bedran**: ve hate pêşkêşkirin , û wergera hin perçeyên bijarte ji gotinê ev e: ( ….Me bi koçbarkirina mamoste Îsma'îl Omer , xebatkarekî bê hempa ji bo gelê Kurd û welatê Sûriyê wenda kir….. Ew xwedî roleke zor gîring di nav tevgera siyasî ya Kurd û niştimanî de bû. …. Bi çûna wî ziyaneke mezin gihaye Tevgera Kurd û niştîmanî li Sûriyê. )
**********************************

**Gotina Encûmena siyasî ya Kurd, ji hêla Dr. Ebdil-hekîm Beşar** ve hate pêşkêşkirtn., û wergera hin perçeyên bijarte ji gotinê ev e : ( … Bi barkirina mamoste Îsma'îl Omer , tevgera me ya Kurd li Sûriyê yek ji berzitirîn xebatkar wenda kir.. Di nav hevalên xwe û tevgera Kurd de, roleke erênî dilîst. ….Xebata wî ji bo çareseriyeke demokrat û dadmend ji doza Kurd li Sûriyê re bû…..
************************************

**Gotina Pariya Pêşverû , ji hêla mamoste Hemîd Hec Derwêş ve hate Pêşkêşkirin.** Wergera hin perçeyên neqandî ji gotinê ev e : ( ….Çûna wî ya zû, ziyana hemî tevgera me ya Kurd û Sûriyê bû…. Birayê me, bavê Şiyar xwedî sinciyên Kurperwer û welatparêz bû, lewre jî di nav tevgera me û ya Sûrî de jî xwedî roleke erênî bû… Di navbera me de têkliyên biratî yên germ hebûn … Xem û qisaweta me gihana hevkariyê di navbera basikên Tevgera Kurd de bû , û emê ji bo vê dozê bi birayê xwe yên Yekîtî re her berdewam bin ….)
**********************************

**Gotina Encûmana ragihandina Şamê. Ji hêla birêz Kibraîl Mûşê** ve hate pêşkêşkirin, û hin perçeyên wergerandî ji gotinê ev in : ( … Herkesê ew di nav tevgera welatparêz de, ji nêzîk ve dinasî , têdigihîşt ku çiqas mirovekî welawparêz dilsoz... bû…..Tevî kar û xebata wî ji bo doza gelê xwe…. Ew ji guhdana bi doza welêt nedima … çareserkirina doza gelê xwe , di nav çareserkirina doza Sûriyê de didît … )
***********************************

**Gotina dostên rehmetî ji hêla birêz Zuhêr El-boşî**
ve hate pêşkêşkirin, vaye hin perçeyên wergerandî ji gotinê : ( …Ez pir dudilî mam , ku serê kê sax bikim, yê kek Mihyedîn Şêx Alî, sekretêrê Yekîtî, an hevalên wî, anjî yên beşdaran.Min ji xwe bêtir tu kes nedît , ji ber me dost û hevalekî zîrek wenda kir…. Kocbarkirina mamoste bavê Şiyar ne ziyana partiya Yekîtî bû û hew, belê ziyana tevgera Sûriyê tev de bû…)
*********************************

## Gotina Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Xwîşk û birayên hêja…
Nûnerên partî û rêxistinan…
Beşdarên rêzdar…
Hûn tev bi xêr hatin, bila serê we hemiyan sax be.

Îro, roja Sêşemê 19ê meha Tişrîna yekê sala 2010an, rojeke dîrokî ye, ku li gundê QEREQOYÊ we xatir ji mamoste Îsma'îl Umer xwestiye. Ew bi dilekî rihet, bi rûyekî sipî çav damirandin û ji vê dunya ronik ji nav me bar kir.

Xwîşkino,birano…
Mamoste Îsmaîl Umer-Bavê Şiyar- çendî berpirsiyar û serokê partiya xwe bû, ewqas jî nefis biçûk bû, hevalê hevalê xwe bû, xwe di ser miletê xwe re ne didît, bi herhawî mirovhez bû. Lewre jî, çûna wî ne tenê xisara partiya me bû,
lê belê, xisara tevahiya Tevgera Kurd bû, xisara Kurd û Ereb bû,û xisara Sûriyê bû.
-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Sultan başa-el-etreş, Şêx salih el-elî û Îbrahîm **D.R ( 3 )**

www.arsivakurdi.org

Henano ye!.
- Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Dr.Qasimlo, Şerefkendî, Samî Ebdirehman û Mele Mustefa Berzanî ye!
-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Mûsa Enter, Fayiq Bocaq û Se'îd Alçî ye!
-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Hemze Niwêran, Cegerxwîn, Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza ye!
-Cî û warê Îsma'îl Umer li ba Ebdilhemîd Zîbar, Ebdirehman Osman û Dr.Newaf Husên e!

Soz û peyman, em dê li ser riya dilsozî û hişmendiya nemir mamoste Îsma'îl Umer berdewam bin û bixebitin.

Careke dî, bi navê Komîta birêvebir ya parta Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, em serê we hemiyan sax dikin, bila hûn xweş bin , dost, heval û hogirên Îsma'îl Umer sax bin, xelkê Qereqoyê, parêzgeha Hesîça û gelê Sûrî xweş be. Merivên heval Îsma'îl, keç û lawên wî sax bin. **Sipas ji guhdariya we re.**

19.10.2010Z

**Têbîn:**
Hêjayî gotinê ye ku, gotinek bi zimanê Erebî jî, ji bo birayên me Ereb jî, ji hîla sekretêrê partiya me ve hate xwendin.

***********************************


**Gotina xwediyan** ji hêla kurapê bavê Şiyar birêz Umer Umer ve hate pêşkêşkirin. Vaye hin perçeyên bijarte ji deqê ( … Ey bira û xwîşkino**! .** Bi nave malbata nemir, em beşdariya we sipasdikin … Beşdariya we nîşana hezkirina we ji nemir bavê Şiya re ye…Heweha hevpişkiya we ji êşa me re, nîşana hesta we ji dozên hevpişk di navbêna me de ye…Li dawiyê ez li we dirêj nekim, ez jî serê we û hevalê wî sax dikim.

***********************************

**Kurtejiyana maoste Ismaîl Umer**

Sala 1947an, li gundê Qereqoyê- ya girêdayî bajarê Dirbêsiyê -ew ji diya xwe re bûye.

Sala 1953an, li dibistana gundê xwe, dest bi xwendina seretayî dike û sala1958an wê qonaxê diqedîne. Piştî wê, bi armanca xwendina navîn, ew diçe bajarê Dirbêsiyê ku derdora 15 km an ji gundê wan dûr e û sala 1965an bekalorya kuta dike û li Zanîngeha Şamê dibe xwendekarê beşa Xaknîgariyê û sala 1969an, xwendina Zanîngehê jî diqedîne.



Sala 1970, dice leşkeriya welatê xwe Sûriyê û di şerê Oktoberê sala 1973an de beşdar dibe, di wî şerî de, ew li nik efserên xwe yên mezin, bi mêrxasî û gernasiya xwe dibe nimûneyeke balkêş.

Sala 1963an, di Partî de dibe endam û dest bi xebata netewî dike. Dema li sala 1965an, yekemîn parçebûn li Partî dest da, mamoste dibe alîgirê Çep. Sala 1975an, ji leşkeriyê vedigere, careke din di Partî de, dibe endamê komîta heremê û sala 1983an, dibe endamê komîta navendî û di nivîsgeha rêzanî de bi çalakî dixebite.

Sala 1988an, ew digel çend hevalan dev ji Partî berdide û sala 1989an kongirekî li dar dixe. Di Tîrmeha sala 1990î de, digel hevalê partiya Çep û partiya Kar, kongirekî yekîtiyê li dar dixe û partiya Yebûyî dadimezrîne û mamoste Ismaîl dibe sekreterê partiyê. Li ser riya yekîtiyê, careke din, sala 1993an, yekîtiyekê di navbera parta Yekbûyî, Pale û Hevgirtia Gel de li dar dixe û partiyeke nû bi navê Pariya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Sûriyê(YEKÎTÎ) dadimezrîne û birêz Ismaîl Umer dibe sekreterê wê. Ji sala 2001ê ve, weke serokê partiyê, di kongir de tête hilbijartin.

Birêz Ismaîl Umer, bavê sê kur (Şiyar, Bengîn, Sîpan) û keçekê(Rojîn) ye.
Xwedayê mezin wî bi dilovaniya xwe şa bike û wî di buhuştê de cîwar bike.

www.arsivakurd.org

# Nameyên Sersaxiyê

Nameyên Sersaxiyê

**Bi** şîn û êşeke mezin me nûça koça dawî ya xebatkar Ismaîl Umer serokê partiya yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê( yekîtî) bihîst, di dema ku em sersaxiya germ pêşkêşî hevalên partiya yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê dikin, me di rêxistina Elmaniya de ya Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, biryar daye ku em wê ahenga ji bo vejandina bîranîna bîst û şeş saliya koça dawî ya helbestvanê mezin seydayê Cegerxwîn -ya ku wê li bajarê Vechta li Elmanya di 23.10.2010 an de bihate sazkirin- têkda bibin. Herweha em jî bi hevalên Partiya Yekîtî ya Demoqrat re vê şînê di koça dawî ya mamoste Ismaîl Umer de - yê ku pirê jiyana xwe di ber bidestxistina pirsa miletê xwe de borandiye, pevre dikşînin.

Em sersaxiya hevalên Partiya yekîtî ya Demoqrata Kurd li Sûriyê û ya hemû zarûzêçên gelê Kurd bi vê koça dawî ya kurekî wanî xebatkar, dikin.

**Rêxistina Elmaniya ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê**

**************************************

**BEHÎNAME**

**Bi** navê Xwedayê pak ê dilovan .

Em ji Xwedê re ne û emê lê vegerin

Biraderên hêja : Di komîta sersaxiya nemir BAVÊ ŞIYAR û yên di partiya Yêkîtî ( Elwehdê ) de , serê we sax be, Xwedê cezayê we xêr binivîse , ji dêla şîna we şahiyê vegerîne û Xwedê li mamoste ISMA'ÎL UMER bibûre . Dostên hêja : Li min biborin, min nikarî li sersaxiyê amade bibim . Ji sedema rewşa taybet û kiryarên civakî yên bi min re derbasbûbûn. Ez xemgînim û bi meraq bûm di wê behiyê de beşdar bibim, ji ber nirxê BAVÊ ŞIYAR gelek li cem min heye, nexasim min ew ji nêzîk ve naskiribû û nayê ji bîrkirin wek kes yan endamek civakî yan xwedî ramanek ronak û bizavek siyasî û bi rûmet.

Koçbûna BAVÊ ŞIYAR hestê netewî bi milet re geş kirin û bû livandinek di derya karên siyasî ji Kurdên Sûryê re û wê bibe egerekî herî xurt ji partiya Yekîtî re, ku encamên serkeftî bi dest bixe Hûn bimînin di xweşiyê de

**BIRADOSTÊ MÎTANÎ**23 . 10 . 2010

**Rêxistina Elmaniya ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê**
**Sersaxî**

**E**ndamên nivîsgeha navendî…

Heval û endamên Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê (Yekîtî),

Malbata Xwedê jê xweş Isma'îl Umer yên birêz.

Îroj bi nûçeya koça dawî ya mamoste û xebatkarê Xwedê jê xweş Isma'îl Umer re em pir xemgîn bûn, û bi vê koça wî, ziyanek pir mezin gihişte Tevgera Kurd û niştimanî û Danezana şam di hindurê Sûriyê de. Ji ber ku Xwedê jê xweş, roleke wî balkêş di nav pêşvebirina çalakî û pêdanasîna pirsa miletê Kurd de di hindurê Sûriyê de hebû.Herweha keda wî bo bidesxistna mafên hemû gelê Sûriyê di rêka avakirina sîstemeke demoqrat û pêşketî de hebû.

Bi vê koçê, hemû endamên rêxistina partiya me li Elmaniya, biraderek û dostekî xwe yî xebatkar , hevkar û dilawer winda kir. Em bawerin ku cihê wî vala namîne, û hevalên wî dikarin wan doz , hêvî û daxwazên wî bighînin serî.

Em sersaxiyê ji heval , hogir û malbata Xwedê jê xweş re û aramî ji we re dixwazin. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike.

18.10.2010

---

Bi dilekî xemgîn me nûçeya koçkirina mamoste Ismayîl Umer (Serokê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê) wergirt di demekê de ku gelê Kurd li Sûriyê di zehmetrîn qonaxên jiyana xwe de derbas dibe. Mixabin tişt ji destê mirov dernakeve ji bilî ku lavayan bike, ku giyanê wî di cihekî aram de razana xwe ya sermedî bibîne.

Em sersaxiya malbat, dost , heval û hemû miletê Kurd û hêviya hedanê di vê helkefta xemgîn de ji bo wan dikin.

**Mistefa Mihemed "Bavê Kurd" – Endamê berê yê Parlemana Sûriyê**
**Luqman Ehmed – Hunermendê şêwekar**
**Mistefa Ibrahim – Çalakvan**
**Cîhad Salih – Rojnameva**
**Sîrwan Qiço – Rojnamevan**
**Majda Darî – Helbestvan**

www.arsivakurd.org

## Nameyên Sersaxiyê

Bi xemgîniyeke zor giran me nûçeya jidestana mamosteyê hêja kek Sma'îl Umer bihîst. Birastî.. Ew nûçeye reş pir ji nişkave hat, koçkirina kek Sma'îl qet ne di bîr û balan de bû, û ji kûraniya dil wijdên de em êşandin.

Jidastana biracanê hêja Sma'îl ne tenê di warê siyasî de ziyaneke mezin e, ew di warê çand û rewşenbiriyê de jî, nemaze di warê çand û rewşenbiriya Kurdî de, ziyaneke zor mezin û pir giran e.

Em û kovara me PIRS di warê çap, belavkirin û pişgiriyê de dêndarê şexsê kek Sma'îl û hevalên partiya wî Partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Suryê ne, xemxwariya wî ji bo derçûna kovara me ya bi zimanê dayîkê nayê jibîrkirin.

Birastî.. Yê ku kek Sma'îl nas dikir, zane ku kesên mîna wî di nav me de pir hindik in, salixên kesane yên payebilind û nirxdar ku li ba wî hebûn, bi hêsanî û bi hev re li ba kesekî peyda nabin.

Kek Sma'îl ta dawiya jiyana xwe ji doza azadiya gelê xwe yê Kurd re, û ji tevahiya nofên gelê Sûryê re dilsoz bû; Ew rêberkî bên fereh, pêdar, dilsoz, xwedî hjêviyên mirovane û mezin, û bi ser her tiştî de jî rewşenbîr û zana bû.

Bêguman.. Hêviyên wî di pêkanîna azadiyê de, ne xewn in û dê di demekê zû de pêk werin.

Kek Sma'îl dê herdem di bal û dilê me de be, û emê şopa xebata wî bi dilgermî bajon.

Bila serê gelê Kurd û hemî berketiyên ciwanemerg kek Sma'îl Umer xweş be.

**Sernivîserê Kovar PIRS -**

**Efrîn… 19.10.2010**

## Nameyên Sersaxiyê

**Birêz birêveberiya Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê…**
**Rêz û silav…**

Mixabin, bi xem û kovanek mezin ve, me nûçeya koça dawiya mamoste Îsma'îl Umer Elî, Serokê partiya we ya xebatkar bihîst . Di vê derheqê de, tevî derbirîna xem û nerihetiyên xwe bona jidestçûna wî xebatkarê mandînenas ku bêguman xesarekî mezin e bo Tevgera Kurd bi giştî û bi taybetî bo partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, em behî û serxwesiyê xwe li we birêzan û hemû endam û alîgirên we , dost , nasyar û malbata birêz ya xwedê jê razî dikin û sebir û aramiyê ji tev aliyekê re dixwazin û xwe jî di vê xemê de bi şîrek û beşdar dizanin . Cihê xwedê jê razî buhuşta berîn be.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera siyasî**

*********************************

**Ji: Dr. Kemal Sîdo – Ronìcar - Komela Roj ya çanda kurdî**

**Xwîşk û birayên Hêja,**

Bi xemgînî me agahdariya wefata birêz Isma'îl Emo, serokê Partiya Yekitî ya Demoqrat a Kurd bihîst. Em bi vê xeberê gelek xemgîn bûn. Isma'il Emo siyasetmedarekî Kurd î hêja bû. Ewî herdem ji bo mafên gelê Kurd têkoşîn û ji bo yekgirtina hêzên democrat ên Kurd xebat kiriye. Bila serê gelê Kurd û malbata wî sax be. **Dr. Kemal Sîdo**

*********************************

Bi navè hemì Kurdèn me li Ispaniya ezê bèjim rehma Xwedè lè be .Xwedè sebrekè bide mala me hemìyan û mala serokè Partìya Yeketî Isma'il Omer . Ew bira , heval, dost ù serokè me hemiyan bù.

**Ronìcar Ji Ispañiya**

www.arsivakurdi.org

## Nameyên Sersaxiyê

### Ji Lênûsa bin kon

**Bi** navê rêxistinên Partiya AZADÎ, em sersaxiyê ji gel û millet re dixwazin…
Çûna Bavê Şiyar, ne tenê zirar ji malbata wî yan ji partiya wî re, belê ji me hemiyan re bû, ji ber ku kesên ji bona aştiyê, azadî û mafê mirovan xebatê dikin, ew dibine layên gel û welat bi tevayî.
Rêxistina: Kobanê, Serê Kaniyê, Amûdê, Qamişlo, Rimêlan, Dêrik û Hesekê.

**Sipas**

******************************

**Di** têkoşîna miletê Kurd de, gelek têkoşer derketine, pirê wan ji ber zulm û zora dijminê me yê hov û ne mirovahî di demeke zû de koçberiya dawî kirine û ne gihiştine armancên ku dixwestin ji bo millet pêkbînin. Tu jî ey dost û mirovê hêja bavê Şiyar yek ji wan têkoşeran bû. Di baweriya min de, digel hinik cudayetî di nêrînên me de, lê bêguman, tu welatparêz bû, û çi cara me giftûgo bikira, tu bêtir ji min ve dihate naskirin. Ez bi hêvî me ku cihê te li cem wan pakrewanên miletê Kurd be!.

**Izeedînê Fatimê(Bavê Kîm)**

20/10/2010

*****************************

**Bi** navê Xwendekarên Zanîngeha Hesekê
Em sersaxiyê ji xwe re û ji we re dixwazin. Bi rastî, bavê Şiyar li gelek civatan bi me re rûnişt, herdem wî hêz dida me xwendevanan û şîretên xweş li me dikir. Ji bo em xwendina xwe berdewam bikin û em bi serkevin. Ji bo di pêşerojê de em karibin tiştekî ji miletê û welatê xwe Sûriyê re bikin.
Dîsa em sersaxiyê ji xwe û ji miletê Kurd re dixwazin û em bi hêvî ne Xweda wî bi buhuşta xwe şa bike!.
Xwendevanên Zanîngeha Hesekê
21/10/2010

## Nameyên Sersaxiyê

### *Birûska Rêxistina Jinan ya Helebê*

***R**êz û silavên hevaltî…*

*Em, rêxistina jinan ya partiya Yekîtî li bajarê Helebê, bi êş û jan nûçeya barkirina hevalê rêzdar, serokê partiya me mamoste Ismaîl Umer (bavê Şiyar) bihîst. Bêguman, çûna xebatkarekî mîna hevalê bavê Şiyar, ne tenê ziyana malbat û hevalên wî, lê belê ziyana gelê Kurd li der û hudir welêt û ziyana gelê Sûriyê bi hemû reng û netewên xwe ve ye.*

*Hevalê me bavê Şiyar, xebatkarekî dilêr û xemxwarê serbestiya civakê bû, loman jî ew ji doza jina Kurd re piştgir û alîkar bû.*
*Em bi navê rêxistina Jinan li bajarê Helebê serê hemû heval û hogiran nemaze yên komîta rêvebir, jin û zarên bavê Şiyar û gelê Cizîrê ser û ber sax dikin. Bi soz û peyman emê li ser riya wî berdewam bin û hêviyên wî vejînin û bibin serî.*
21/10/2010

***Rêxistina Jinan Ya Helebê a (PYDKS***

### Birûskek ji malpera Welatê me

**E**z ji xwedayê dilovan dixwazim mehdera xwe lêke û sersaxî ji malbata wî re, Kesên mîna wî di dîroka Kurdî de dimînin, serê we sax be!.

**B**irêz malbata Ismayîl Omer….
Partîya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê…
Bêguman koça dawî ya apê hêja bavê Şiyar derd û xemên me nûjen kirin.
Bi navê malbata Rezoyê Osê sersaxiya we tevan dikim. Bere serê gelê Kurd, malbat, heval û hogirên Xwedê lê xweş be sax be.
Em hêvîdar in ji Xwedayê gewr re bavê Şiyar bi rehmeta xwe şa bike.
Bere cîgehê apê hêja buhuşt be.

**Malbata Rezoyê Osê**

www.arsivakurd.org

# Nameyên Sersaxiyê

Gelekî zor e ku mirov di şîna dostekî, siyasetmedarekî mîna bavê Şiyar de his û hestê xwe bîne zimên…Belê em çi bikin?. Kes nikare li pêş qederê bisekine…

Tiştê ku ez dikarim di vê derbarê de bibêjim ev e: Stêrek geş ji asmanê siyaset û rewşenbîriya Kurdî rijiya…Erê dema ku ez dibêjim rewşenbîrî, ji ber ku ew û partiya wî piştgirên rewşebîran bûn. Rehmetî di vî warî de, ji bo rewşenbîran piştgirekî sereke bû, ta radeyekê ku weşanên partiya wî ta roja îro bi berdewamî têne weşandin, weke PIRS, NEWROZ . Û çalakiyên cure-cur, hersal ku partiya wî "Cejna rojnamegeriya Kurdî" saz dikir, rewşenbîr, nivîskar û rojnamevan kom dikir û gelek caran jî ew xelat dikirin…Ev çalakiyên ku me li rex parityên din nedîtine…

Belê, Kurd dibêjin: Ga dimire, çerm dimîne, mêr dimre, nav dimîne. Ez bi xwe bawer im wê navê bavê Şiyar wek aleke bilind di nav Kurdên Sûriyê de bimîne. Ji qencî, durustî, wefadarî, dûrî nijadperestiya teng û şoven …Her û her wê bimîne wek sembolekê ji nifşên nû re…

Ji heval û hogirên wî bi hêvî me, ku li ser rêbaza wî bilivin, xwe jê nedin alî…

Serê malbat, partiya wî û gelê Kurd sax be!

**Konê Reş22/10/2010**

---

Bi dilekî kovan, ev gotinên han di nav coşa dilê min de radibin û datên, belav û kom dibin.

Mamosteyê hêja, ji 35 salan min ew nas dikir, mirovekî Kurd î dilsoz û bînfireh bû, di xebata parastina gelê xwe de bê rawestan bû û karên wî, payebilind û bi kêrhatî bûn.

Mamoste Ismaîl Umer weke kesayetiyeke Kurdî û hevalên xwe xemxwarên parastina yekîtiya rêzên Kurdî bûn, çira û fenera şeva reş bûn…

Mamoste, di nav kar û xebata xwe û

# Nameyên Sersaxiyê

tevahiya dema wî de rewşenbîriya kurdî û rewşenbîrên Kurd her dem di hiş û bîra wî de bû. Ji ber vê jî, jimareke hêja ji rewşenbîran li dora wî û rêxistina wî bûn û bi alîkariya wan, berhemên hêja afirandin û weşandin.

Şîna mamoste Ismaîl Umer, şîna rewşenbîrên Kurd e.

Sersaxî ji bo malbata Ismaîl Umer, ji bo hevalên wî û ji bo rewşenbîrên Kurd.

Ez sersaxiyê ji bo hemû Kurdan dixwazin.

**Derwêşê Xalibê Derwêş**22/10/2010

---

Bi navê Girûpa Hesekê ya rewşenbîriya Kurdî, em sersaxiya miletê Kurd dikin û bila serê millet sax be

Xwedayê mezin, gunehê wî bibûrîne , vê şînê şahî bigerîne, û cihê wî buhuşta rengîn bihêle.

Em bi hêvî ne ev komcivîn bo nêzîkbûnê di nav partiyên me de bibe navendok.

Mamoste Ismaîl, serokê partî û lawê miletê xwe bû, xwediyê sincên bilind rewiştên paqij bû. Ji kaniya zelal, şîrê xebatê vexwariye, mirovekî xwedî helwest, xwediyê hestên tenik û bihnek fireh bû. Mirovekî perwer û bîrwer bû. Û hûn bimînin bo kar û xebatê.

**Girûpa Hesekê ya rewşenbîriya Kurdî**

19/10/2010

---

Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê…Hevalên Komîta rêvebir

Bi koçkirina hevalê hêja Ismaîl Umer, û bi bihîstina vê nûçê, em pir dilêş û sergêj bûn. Lê, di demeke gelek giring de, li şûna vî mirovî valahiyek ma. Bêguman, hebûna vî mirovî cihê rastkirina şêwe, rêç û şivîlên bizava tevgera Kurdî li Sûriyê bû.

Vî mirovî di demeke kurt de, karîbû civata Kurd li Sûriyê bigihîne asteke bilind. Di dawî de, hêvî û omîda me ji Xwedayê mezin ew e, ku birayê me Ismaîl bi buhuşta xwe şa bike û wî têxe bin dilovaniya xwe û serê miletê Kurd saxb e!.

**Malbatên Berzençiyan li Qamişlo**

www.arsivakurdi.org

## Nameyên Sersaxiyê

**Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê.**
**Malbata Nemir Mamoste Ismaîl Omer.**

Bi dilekî xemgîn , bi êş û keder me nûçeya koçkirina nemir, serokê partiya yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriye mamoste Ismaîl Omer bihîst. Ez bi navê malbata Cegerxwîn sersaxiya Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê û heval û endamên wê û malbata nemir dikin. Bila serê miletê Kurd sax be, û her û her wê di bîra me de bimîne û ji bîr nabe. Xwedê wî bi dilovaniya xwe şa bike û cihê wî bihişt be.

**Stockholm 18.10.2010**
**Malbata Cegerxwîn**
**Kesra**

*********************************

Sed heyf û mixabin bavê Şiyar koça dawî kir.

Malbata `Emo…..

. Partîya Yekîtî ya Demokrat a Kurd Li Sûriyê Heval, dostên wî..

Belê, pakrewanê xebatkar û welatparêzê Kurd mamoste Îsmaîl Omer koç kiriye nav karwanê şehîdên miletê Kurd. Ber bi jor ve bilind dibe û bi tîrêjên ronahîya roja jîndar re wê dara azadîyê şîn, bi ber û fêkî bihêle.

Bavê Şiyar bi vê çûna xwe- ya ku ne di çaxê xwe de bû- dilê her Kurdekî bi kul û xem kir.

Ez bi navê malbata Mela Ehmedê Namî sersaxiya gelê Kurd , partî, heval û hogirên Xwedê lê xweş be dikim. Hêvîdar im ji yezdanê pak û dilovan, ku cîgehê wî buhuşt be.

De bere serê miletê Kurd û serê we sax be.

**Samî Ehmed Namî**
**Stockholm. 2010.10.18**

## Nameyên Sersaxiyê

### Behîname

**Roj baş kek.....!**

Di navbera hevnasîya me de, deh sal derbas bûn, lê min hûn qet ji bîrnekirin. Karguzarîya ku we ji min re kir, ez çicar ji bîrnakim. Hûn di dilê min de heya roja mirinê dijîn. We di dilê min de, cîyekî taybetî standiye birayê delal. Ji xwîşka min re silavên min bêje. Têm çavên hersê xortan. Ji hemû nasan re silavên min hene.

Birayê delal, du demjimêr berê Mahfûzê ji min re têlefon vekir, nûçek reş da min, ez xemgîn bûm, berketim, kesirîm û dil ji min parçe bû. Got "Kek Îsmaîl çûye heqiya xwe".
Belê birayê delal, nûçek wisa, nûçek reş e. Lê, em çi bikin, zagona xweza wisa ye; kes di vê cîhana derewîn de nemaye. Em gîşt rêwîyê wê riyê ne. Lê, bi rastî mirin hêj ji kek Îsmaîl re zû bû. Ji ber ku ew hê ciwan bû, wexta wî ya mirinê nebûbû. Lê, em çi bikin keko, çavên felekê kûr be, li ciwan û kalan nanêre. Ji xwe em Kurd bi piranî di ciwantîya xwe de dimirin, yan jî dijmin me dikuje. Serê we sax be, serê zarokên wî sax bin, serê gelê Kurd sax be.

Kek....., bi kerema xwe van gotin û vê peyama min bigîhîjîne neferên malbata kek Îsmaîl û heval û hevriyên Partîyê.

Carek dî "serê we sax be" dibêjim, têm çavên te maç dikim, saxî û serkeftina we dixwazim. Silav û rêz.

**Riza ÇOLPANÊ DERSİMÎ**
**19-10-2010 Sydney**

****************************************

**Heval û dostên partiya Yekitî**

Bi xemgînî me nûçeya koçkirina birêz Ismail Imer serokê partiya we bihist. Ew mirovekî kurdhez û xebatkar bû, hemû jiyana xwe di ber doza gelê xwe de terxand. Hêviya sebir û aramî bi we û malbata wî dikim. **Salih Cefer** Holenda

www.arsivakurdi.org

# Gotina Berpirsiyarê Rêxstina P.Y.D.K(Yekîtî) Li Ewropa di behiya nemir Îsmayîl Omer de

**Xwîşk û birayên hêja..**
**nûnerên partî û rêxistinên dost û bira…**
**Hevalên hêja…**

Berî hertiştî ez bi navê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê beşdariya we îro li vir silav dikim û spasiya we hemûyan dikim ku hûn bi vê yekê dixwazin rêz û giramiya xwe ji giyanê nemir mamoste Îsmayîl Omer re diyar û pêşkeş bikin. Helbet ev tenê wê wateyê dide, ku miletê me, li kû dibe bila bibe, tu caran xebatkarên xwe ji bîr nake, wan bi tenê nahêle û herdem xwedî li wan der dikeve. Miletekî weha jî, bê guman, dê dûr an nêzîk, bigihîne armanc û daxwazên xwe, dê bigihîne azadî û serbestiya xwe.

**Xwîşk û birayên hêja…**

Bi dilekî xemgîn, baskine şikestî û bi çavine tijî rondik me nûçeya koçbarkirina dawiyê ya xebatkarê hêja mamoste Îsmayî Omer, serokê partiya me, Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê, bihîst.

Mamoste Îsmayîl ne tenê serokê partiyekê bû, ne tenê kurdekî welat- û netewparêz bû. Ew beguman:

Mamosteykî bi hemû wateya gotinê bû, dibistanek bû. Em her fêr¬ dikirin bê çawa peydakirina dostan ji doza me re girîng e; bê çendî diyalog û hevpejirandin girîng e. Em fêr kirin bê çawa mirov di xebata xwe de deyan û dilsoz be. Em fêr kirin bê çawa mirov ewqas nêzîk dost, heval û gelê xwe be û herdem di nav wan de be. Em fêr dikirin bê çawa mirov dikare bê westan ji bona yekîtiya Tevgera Kurd û avakirina nûnertiyeke netewî bixebite; ¬

Mirovhezekî ji dil de bû. Ji rabûn û rûniştinên wî, ji axaftinên wî û ji lebat û kirinên wî her ew rastiya dixuya ku mamoste perestvanekî maf û azadiyên mirovî bû;

Kurdayetîparêzekî deyan û serhişk bû. Wî 47 salan bê westan ji bo¬ doza gelê xwe yê kurd bi hemû derfet û şiyana xwe xebat kir. Hertim jî ew hîn tî û birçiyê kar û xebatê bû;

Diyalogperest bû. Nemir herdem bi her kesî¬ re, ne tenê bi dost û hevalan re dikarî bi nermî (lê bêyî ku ji bîrdozên xwe yên kurdayetiyê paşde vegere) diyalogê bike. Wî her hewil dida ku dostan ne ji xwe û partiya xwe re, lê ji doza gelê xwe re, ji azadî û wekheviyê re peyda bike.

Ji ber van xeysetên nemir ne tenê dilê me, belê dilê her dost û çi–hevalê ku mamoste Îsmayîl Omer (rehma Xwadê lê) nas dikir yan pê bihîsti bû bi nûçeya koçbarkirina wî ya dawiyê xemgîn bû.–kurd, çi ereb yan asûr û siryan

**Xwîşk û birayên hêja:**

beşdariya me îro li vir, helbet, nîşana wê yekê ye, ku em dixwazin li hemû wan nirx û taybetiyan, yên ku mamosteyê me yê nemir ji bo wan dixebitî, bi bîr bînin û ji bo parastin û pêşvebirina wan jî amadebûna xwe nîşan bidin. Ew nirx jî bi kurtî ev in:

1. Parastina nirxên rasteqîn yên kurdayetiyê;
2. Dijberiya nijadperestî, şovenîsm, tundrewatî û çavtengiyê;
3. Xebata bo pêşxistin, serastkirin û duristkirina hizr, boçûn û bîrbaweriya mirov û civaka me;
4. Xwedîderketina li vîn û daxwazên gelê kurd bona jiyaneke azad di welatekî demokrat de;
5. Parastina taybetmendî û serbixweyiya doza kurd li Sûriyê.

**Beşdarên xweşewîst,**

helbet koçbarkirina xebatkarekî weha, ku piraniya jiyana xwe bona gelê xwe yê kurd û doza wî ya rewa û dadmend terxan kiri bû, ziyaneke gelek mezin, giran û ê êşdar e. Ne tenê ji partiya me re, belê ji

D . R ( 10 )

www.arsivakurdi.org

tevaya Tevgera Kurd û tevgera demokrat li Sûriyê re. Çunkî ne hertim û ne jî li her ciyekî ew xebatkar peyda dibin, yên ku yekîtiya partî û tevgera xwe û berjewendiya gelê xwe di ser her tiştekî din re digrin. Lewre jî em vê koçbarkirina dawiyê ya mamosteyê nemir Îsmayîl Omer weke jidestdaneke mezin, pir mezin, dibînin. Lê yê ku hinekî dilê mera rehet dike ew e ku dawiya jiyanê ji xebtkarên weke mamoste Îsmayîl Omer re destpêka jiyaneke nû ye. Mamoste Îsmayîl ne mirî ye, ew di wijdana gelê xwe de zindî ye, ew tev li çi li welêt, çi–karwana nemir û şehîdan bûye. Xwedîderketina keç û lawên kurd li rehmetî vê rastiyê diçespîne.–jî li derveyî welêt

**Xwîşk û birayên hêja**,

Di heman dema ku em ji gelê xwe re, ji dost û hevalên partî û tevgera xwe re, her weha ji tevgera demokrat a sûrî seranser re dibêjin: bila cihê rehmetî Buhuşt be û serkeftin jî ya doza me ya netewî û demokrat be, dixwazin bînin bîra me tevan ku xwedîderketina li xebatkar û nemiran tenê bi xwedîderketina li bawerî û bîrdozên wan dibe. Loma jî ji me hemû heval û hevriyên nemir tê xwastin ku em rojekê zûtir li xwe vegerin, berjewendiyên bilind yên gel û tevgera xwe di ser hertiştekî din re bigrin, da ku em hemû bi hev re kari bin yekîtiya Tevgera Kurd û avakirina lêvegereke kurdî di demeke nêzîk de ji gelê xwe re, ji xebatkarên zindî û ji şehîd û nemirên xwe re bikin mizgîn. Ev berpirsiyariyeke me li hember gel û nemirên me ye. Tenê bi vê yekê em dikarin xebata xwe ya li pênawî avakirina sûriyeke demokrat, ku tê de hemû mafên netewî yên gelê me bêne bidestxistin, xort û berhemdartir.

Bi yekîtiyeke wisa, helbet, emê hem baştir kari bin bi hêz û kesên demokat ên ne kurd (ereb û aşûr) re bidin û bistînin, hem li hember destlata şoven kari bin bi hêz xwe ragirin, hem jî çêtir bi erk û stûbariyên xwe yên netewî beramberî birayên xwe li perçên din ên Kurdistanê rabin. Ji bo pêkanîna van erkên pîroz jî em soz didin ku emê her di vê yekê de berdewam bin: Ji bo yekirina Tevgera Kurd li Sûriyê çi ji destê me bê, emê bikin. Ji ber ku yekîtiya Tevgerê li ba me ne durûşmeyeke xwefodilkirinê ye, belê ew armanceke bingehîn e.

Li dawiyê em careke din sersaxiyê ji tevaya gelê kurd û tevgera wî ya rizgarîxwaz re hêvî dikin û dibêjin: Bila ciyê nemir her Buhuşt be. Serkeftin jî helbet dûr an nêzîk ya doza gelê me ya netewî, demokrat, rewa û dadmend e.

Hezar silav ji giyanê nemir Îsmayîl Omer re
Hezar silav li giyanê hemû xebatkarên kurd
Serkeftin bo doza gelê me yê kurd
Bijî azadî, demokrasî û wekhevî
Komîteya Serkirdayetiya Rêxistina Ewropa ya

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê – Yekîtî**

**Elmaniya- Herne, 24.10.2010**

****************************************

**Ragihandin**

**Bi** şîn û êşeke mezin me nûça koça dawî ya xebatkar Ismaîl Umer serokê partiya yekîtiya dîmoqrata Kurd li Sûriyê( yekîtî) bihîst, di dema ku em sersaxiya germ pêşkêşî hevalên partiya yekîtiya dîmoqrata Kurd li Sûriyê dikin, me di rêxistina Elmanya de ya partiya dîmoqrata pêşverû ya Kurd li Sûriyê, biryar daye ku em wê ahenga ji bo vejandina bîranîna bîst û şeş saliya koça dawî ya helbestvanê mezin seydayê Cegerxwîn ya ku wê li bajarê Vechta li Elmanya di 23.10.2010 an de bihate sazkirin, têkda bibin .
Her weha em jî bi hevalên partiya yekîtiya dîmoqrat re vê şînê di koça dawî ya mamoste Ismaîl Umer de yê ku pirê jiyana xwe di berdsetiya pirsa miletê xwe de terxan kiriye, pevre dikşînin .
Em sersaxiya hevalên partiya yekîtiya dîmoqrata Kurd li Sûriyê û ya hemû zarûzêçên gelê Kurd bi vê koça dawî ya kurekî wanî xebatkar, dikin.

**Rêxistina Elmanya ya partiya dîmoqrata pêşverû ya Kurd li Sûriyê 18-10-2010**

www.arsivakurdi.org

## Nameyên Sersaxiyê

**Xwîşk û birayên hêja,malbt û dostên hevalê nemir Isma'îl Omer…. Heval û dostên hêja, endamên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê,**

**Ez** bi dilekî êş , xemgîn ,hesret bi dilovaniya serokê Partiya we, Nemir Isma'îl Omer aghadar bûm. Mixwabin, mirin rastiyek tehil e û ji mirovan nayê qebûlkirin, û ev rastiya tehil beşek ji jiyanê ye.

Tiştê herî giirng ew e, hevalê me yê nemir Ism'aîl Omer bi fîdakarî û nêrînên xwe yên rêzanî rasterast di doza tevgera Kurd a azadî û aştîxwaz de li ba gelê Kurd ciyê serfirazî û pîrozbahiyê ye.

Ev rastiya han,pêwîstiyeke zor giran dide ber çavan.Yê ku ji endam, heval û dostên Partiya Yekîtî tê daxwazkirin ev e: Divê rêz û milên xwe bidin hev û xebatê ji bo azadî,aşîtî u wekheviyê geş bikin. Divê jiyan û ramanên nemir Isma'îl Omer -weke rêzanî- ciyê xwe rojane, di xebata Partî de bigre.

Bila serê gele Kurd sax be.

Nemrin ji bo heval Isma'îl Ome rû cangorên Kurd re.

**Edhem Reşîd**

**Behî name**

*********************************

Di serî de gelê kurd , tevaya heval û hogirên wî , malbata xwedê jê razî , kes û nasê wî , bere serê wan hemiyan sax be .Bi xem û kovaneke mezin me koçîdawîbûna mamoste Ismaîl omer "serokê Partiya Yekîtî ya Demuqrat a Kurd li Sûriyê "bihîst, em bi hest û can peşdarî vê behiyê dibin û zor em bi hêvî ne, ku hûnê vê bûyerê bi sebir û aram derbas bikin .Dîsa jî, ji Partiya Yekîtî re serkeftin di kar û xebata paşerojê de ,ji xwedê jê razî re lê bêbûrîn û bihişt , ji malbata wî re hedan û sersaxî û temenekî dirêj.

**Nivîskar: Xelîl kalo**

## Nameyên Sersaxiyê

**Sersaxî**

**Hevalên hêja, serkirdayetî û endamên Partiya Yekîtî ya Demiqrat a Kurdî li Sûriyê – YEKÎTÎ –**

**Bi** dilê xemgîn, ku kul û keseran şûnên vala tê de nehêştine, min vê nîvroyê xemgîntir nûçe ji medya Kurd wergirt. Çûyîna kekê hêja, xebtakarê dilsoz Îsmalî Omer wek birûskekê li dil û derûna min da, ez tengijandim, hemî derd û kulên min dan alîkî, û şûna wan hemiyan stand. Bawer bikin, ku her çiqas ev çûyîna bê veger bi we tehl û tirş be, sedema daxên giran be jî, , ew bi min û bi her kesên dilsozên doza gelê xwe, ku li van welatên mişextiyê dimînin, û bi hezarên kîlometran ji we û ji welêt dûr in, girantir û dijwartir e. Kekê Îsmaîl ne tenê ji xwe, malbata Emo û partiya xwe re bû, belê wek ku hemî kes dizanin, ew berî pêşî ji tevayê gel û welatê xwe re bû. Tevaya jiyana xwe ji bo erk û armancên gel û welatê xwe re terxandibû.Vê lomê wê di bîriya miletê xwe de her zindî bimîne.

Her çiqas ev çûyîna zû û bi lez daxên dilan xwînzê dike jî, lê ez hêvîdar im, ku domkirina rê û rêçika wî ,dê gelek birînan bikewîne.

Aramî ji bo me hemiyan, û dilovaniya Xweda û bihişt ji bo hevalê me yê dilsoz.

**Bira û hevalê we Heyder Omer**

Almaniya . 18an. 10. 2010

*******************************

**Lêborîn:**

***Ji ber ku birûskên sersaxî ,helbest û gotar gelek bûn, me nikanî tev biweşandana. Em ji wan lêborînê dixwazin***

www.arsivakurd.org



# Em te ji bîr nakin

**_Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de_**

www.arsivakurd.org